




**Li bendê ye Kurd
careke din hilbijartinan
baykot bikin**

»»» R:7



**Êdî nerazîbûnên
li dijî rejîma Îranê,
her roj xurtir dibin**

»»» R:3



*Bideştveanîna mafên netewî yên gelê kurd
di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

Agirî

Duheftînameyek Siyasetî-Gîştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî
www.agirimedia.org Hejmar (359) 07-10-2019 Buha (1000) Tûmen

**Piştguhketî û
nezanî**

»»» R:2



**Pêvajoya nakokiyên
navbera Amerîka û rêjîma
Îranê di qonaxa nû de**

»»» R:4



**Sedem çîye ku xelkê nerazî
li Îranê de yekgirtî nine?**

»»» R:8



Birînên çaresernekirî ên Îraqê dîsa teşene dikin

1 6 sal di ser têkçûna rejîma Beis a Îraqê re derbas dibin û piştî wê, sistemeke federal li wî welatî hate avakirin. Lê belê ji ber çaresernekirina pirsgrêkên bingehîn li wî welatî û destêwerdana berdewam a welatên navçeyê û bi taybetî rejîma Îranê li wir, careke din ji roja sêşemiyê 9ê Rezberê ve meşên nerazîtiyê li piraniya bajar û bajarokên navend û başûra wî welatî derketin holê. Destpêkê li bajarên Necef, Nasiriye û pişt re jî li Bexdaya paytexta Îraqê û navçeya Kesk, xwepêşanderan nerazîtiya xwe li hemberî rewşa wî welatî anîn ziman. Raportên herî dawî ên fermî didin xuyakirin ku zêdetirî 6 hezar kesên di van bûyeran de birîndar bûne zêdetirî 100 kesên jî jiyana xwe ji dest dane.

Du armancên sereke ên van meşên nerazîtiyê hebûn; A yekem nerazîti li hemberî hebûna Komara Îslamî a Îranê li wir û berfirehbûna desthilata wê di navendên biryarê de bû. Armanceke din jî rewşa nebaş a jiyana xelkê û tinebûna xizmetguzariyên pêwîst ji bo xelkê bû. Cudahiya van meşan bi meşên berê re ev bû ku xwepêşander dixwazin destê tevlihevker ê Komara Îslamî li wî welatî bê kurtkirin. Ev jî nîşan dide ku rast e ev 40 sal in Komara Îslamî hewl dide hêjmûniya xwe bi ser wî welatî de ferz bike, lê belê di vî warî de serkeftî nebûye.

Girîngiyeke din a van xwepêşandanan ev e ku îdeolojiya rejîma Tehranê li bajarên mezhebî ên Kerbela û Necefê bi serhildana xelkê rastî têkçûneke mezin hat. Ev gelek sal bûn ku Îranê hewl dida hêjmûniya

xwe bi ser wan bajaran de ferz bike lê niha xelk dibêje Bila Îran Derkeve. Herwisa ala Îranê jî li wir hate şewitandin. Şewitandina baregehên Heşda Şeibî a girêdayî Tehranê jî nîşan dide ku armanca sereke a xwepêşandanan dûrxistina Komara Îslamî ji wir û vegerandina mezinahî û karameta Îraqê ji aliyê ciwanan ve ye.

Di vê rewşa tevlihev de nivîsingeha fermî a Elî Xamineyî di Twitekê de li gor Xamineyî, bûyerên Îraqê bi “dujminên” vî welatî ve girê dan û ragihand ku: Dujmin (Nehatiye xuyakirin ka gelo kî dujmin e?), hewl dide pêwendiyên paqij û tendirust (!) ên di navbera Îran û Îraqê de tevlihev bikin lê belê ev pîlan ser nakevin.

Çend rojan beriya niha jî Husên Şerîetmedarî nûnerê taybet ê Xamineyî di “Kêyhan”ê de berê xwe da xelkê Îraqê û got ku divê balyozxaneyên Amerîka li Îraqê weke balyozxaneya wî welatî li Îranê bê girtin. Amajeya wî dagirkirina balyozxaneyên Amerîkayê li Tehranî



di sala 1357an de bû.

Ji alî din ve beşek ji Heşda Şeibî a girêdayî rejîma Tehranê bi awayekî fermî ragihand ku ewê ji bo piştewaniya dewleta Îraqê bi hemû şewazan li hemberî xwepêşanderan derkevin. Tekez jî kir ku ji bo rêgirtin ji kûdeta yan jî şoreşê, ew amade ne her biryarekê ku dewlet bistîne, bicî bikin.

Encama xwepêşandanan her tiştek be, wê ji du aliyên ve bandorê bike ser rejîma Îslamî a Îranê; A yekê, rewatiya rejîmê li Îraqê û raya giştî li navxwe û derve ye. Herwisa

wê bandorî bike ser pêşeroja stratejiya siyaseta dagirkarî û hevsengiya gefan.

Bi vî rengî wê ev xwepêşandan, binegaheke girîng a rejîmê bikin armanc ku ew jî gotegot û piropagende ne û wê rastîya bûyeran weke xwe nîşan bidin. Xwepêşandan wê nîşan bidin ku berovajî sloganên rejîmê, xelkê welatên derdorê, hebûna rejîmê li welatê xwe û di civaka xwe de pêwîst nabînin. Ev jî dibe sedem ku xelkê Îranê bi bê bandoriya rejîmê û lawaziya wê a rastîn bihesin. Ev heşt jî, li hemberî tevahiya rejîmê popolişt wek hev e û li hemberî rejîma Îslamî a Îranê jî xurt e. Sedem jî ev e ku êdî wê heybeta wan di mejiyê xelkê de bişkê. Ev tê wateya têkçûna heman tiştî ku Xamineyî weke “Xurtbûn” binav dike û hertim behsa wê dike.

Ev meş wê hêjmûniya Îranê bikin armanc û korîdora rejîmê ji bo destêwerdan û henardekirina çekan ji bo Sûriye, Yemen û Lubnanê tîk bibe. Êdî wê Sipaha Pasdaran biekeve hemberî xelkê Îraqê û bi taybetî civaka Şîeyan. Ev rewş tê wateyê ku Îran û Sipaha Pasdaran ne dostên wan in lê belê dagirkar in. Du bijarde li pêşiya Sipahê hene û yan divê vegezin nav sînorên welatê xwe yan jî divê li benda pêşerojê reş û nediyar bin; Ev jî raştiyek e ku em dikarin wê weke teşenekerina birînen çaresernekirî ên Îraqê binav bikin û di rastî de çavkaniya tevahiya van pirsgrêkan jî Komara Îslamî ye.

Sergotar

Piştguhketî û nezanî

N: Kerîm Perwîzî

Dijatiya welat yan deşthilatekê ku hukmê dike ser cihekî, dikare bi sedemên cuda be. Bi vê wateyê ku tevahiya dijberên wê deşthilatê wekhev nîn in û bi armanceke hevpar, dijatiya wê nakin.

Dibe ku hin ji wan, tenê ji ber ku bixwe hevparên deşthilatê nîn in, rola opozîsyonê dilêzin. Eger rojekê hinek ji şêrîniya deşthilatê bigihe wan, dibe ku êdî dev ji dijatiya wê berdin. Hinek jî hene ku hertim dijber in û dijatiya tevahiya deşthilatan dikan.

Di nav van du cureyên dijberan de, dibe ku bi dehan û sedan sedem hebin ku hin kes di pêgeha opozîsyonê de bi cih bibin. Dibe ku mafê girûpa wan hatibe bînpêkirin yan jî di warekî de siyaseta deşthilatê qebûl nekin. Herwisa dibe ku bi giştî îdeolojî û hizreke cuda a wan hebe.

Di opozîsyona Îranî de jî tevahiya van reng û rûmetên cuda tene dîtin. Gelek kes û alî hene ji ber ku ew hatine piştguhxiştin, dijatiya deşthilatê dikan.

Di 4 dehikên sitemkariya Komara Îslamî de gelek tevgerên bi vî rengî derketine holê û pişt re jî bê bandor bûne. Êdî weke take kesan û yan jî weke hin kesên cudabûyî li cihekî ketine. Ji wan re pirsyar çê dibe ku gelo çima xelk guh nade wan û nakeve pey wan. Ji xwe slogan û rîsteyên wan baş û bedew in lê çima xelk, wan weke alternatîv nabîne?

Ev pirsyar, gelek sereke û heştyar e û dibe ku ti yek ji wan, bi regekî êşkere û bê tirs bersiva vê pirsyarê nede. Tevahiya wan û take kesên

Birêz Mîstefa Hicrî serdana mamoste Kerîm Ehmed kir



Lêpirsyarê Giştî yê PDKÎ serdana kesayetiye navûdeng mamoste Kerîm Ehmed kir.

Roja Yekşemî 29`ê Îlonê heyeteke PDKÎ, bi serpereştiya “Mîstefa Hicrî”, Lêpirsyarê Giştî yê PDKÎ serdana mamoste Kerîm Ehmed sekreterê berê yê Partiya Şiyû`î a Kurdistanê û kesayetiye navûdeng ê gelê Kurd kir.

Di vê hevdîtînê de, “Hicrî” tevî pirsîna rewşa tendruştiya mamoste Kerîm Ehmed, bi hilkefta koça dawiyê ya xwedêjêrazî “Beyan” keçika mamoste Kerîm Ehmed, sersaxî gotê û xwe hevparê wê xem a van zanîn.

Her di vê pêwendiyê de, mamoste Kerîm tevî spas kirinê, ji “Mîstefa Hicrî” re hêviya tendruştiyê xwaşt û ragihand ku dostayetiya nêzik ya digel PDKÎ bo me hemyan cihê serbilindî û şanzaiyê ye.

cudabûyî jî, xwe weke rêberên xelkê binav dikan. Lê belê piştî ku çend salan bê bandor dimînin û tene piştguhxiştin, ev pirsyar li cem wan çê dibe ku çima ew nebûne alternatîv? Tevger wê çawan bikare bibe alternatîv û divê ew tevger çawan be?

Yek ji mercên ku tevgerê yan kesek bikaribe li hemberî deşthilat bibe opozîsyoneke ciddî, ev e ku siyaseta û nerîneke tam dijî îdeolojî û siyaseta wê deşthilatê hebe. Merceke din jî ev e ku rast e divê ev siyaseta û îdeolojî li dijî deşthilatê bin, lê belê divê xelk jî van siyasetan qebûl bike. Nabe îdeolojiyeke parvemayî a weke DAIŞê, wek alternatîva Wîlayeta Feqîh bê binavkirin. Lewma jî merca duyemîn ev e ku xelk, vê siyaseta qebûl bike. Dema ku pilankerên vê siyaseta xwestek, şiyar û hêviyên xelkê fêm bikin û tevahiya reng û cudahiyan nava civakê bibînin, wê demê wê xelk siyaseta wan erê bike.

Kesê ku dixwaze siyasetekê danî lê ti pêwendiyê wî bi civakê re tine be û tevahiya rengên cuda ên di nava civakê de nebîne, tenê dikare siyasetekê danî ku beşeke kêr ji civakê wê siyaseta erê dikan û weke wî mirovî ne û wek wî difikirin.

Di civaka Îranê de çendîn netewe hene ku her yek ji wan, xwestek û hêviyên cuda hene. Li bajar û navçeyên cuda ên wan neteweyan jî, çalakvanên sîvîl bi awayekî xwerisk, navendên taybet bi fêrkirina zimanê dayîkê ji bo zarokên neteweya xwe ava dikan.

Di rewşên siyasî ên cuda de jî her yek ji wan neteweyan, bi awayekî cuda li ser pirsên taybet bi xwe heştyar in. Dema ku li Tehranê xwepêşandan tê kirin, Kurdistan, vê xwepêşandanê weke xwepêşandana xwe nabîne. Isfahan jî xwepêşandaneke Kurdistanê, weke xwepêşandana xwe nabîne. Rewş li cem hemû neteweyên din jî bi heman awayî ye.

Di civakeke bi vî rengî de, bernamayeke siyasî a ku behsa “Yekperçeyiya Netewî” dike û henekên xwe bi çarenivîsa neteweyên din dike, nikare ti deşteft û serkeftinan bi deşt bixîne. Ev jî nîşan dide ku pilankerên vê siyaseta, gelek dûrî rastiya civakê ne û ji neteweyên din ên Îranê dûr in û wan fêm nakin.

Êdî nerazîbûnên li dijî rejîma Îranê, her roj xurtir dibin



N: Dara Natiq

Di 9-ê Rezbera îsal de û di çend rojên borî de, pêlek berfireh a nerazîbûna xelkê Îraqê li dijî nebûna xizmetguzariyên bingehîn û gendelî û hejariyê di piraniya bajarên wî welatî de dest pê kiriye. Ew meşên han bi awayekî girseyî li hember dam û dezgehên serbazî û evlehî û tepeserkar û herwisan dewlet û damezrawên yasayî û şer'î ên wî welatî sekinîne û daxwaz dikin ku dawî bi gendelkarî û bitalanbirina sermaye û heyî a welat bêt, û ew hêz û aliyên serbazî di Îraqê de ku sebebkarê sereke yê kavilbûna Îraqê bûn û li pêş hemiyan de diviya hêzên Îranê û yên girêdayî Îranê welatê wan bi cî bihêlin. Herwisan yên ku bi salan e di vî welatî de mijûlî gendelî û kavilkarî û dizî û talankirina heyî û çavkaniyên wî welatî bûn bihên destbiserkirin, û rapêçî dadgehan werin û bihên cezakirin. Xelk daxwaza sistem û deshilateke dadperwer û jiyanek baş bo xelkê hejar û belengaz yê wî welatî dike.

Lê mixabin bersiva daxwazên berheq û meşa nerazîbûna xelkê ji aliyê hêzên tepeserkar û girêdayî Îranê û yên weke Heşda Şe'ibî ve, bi agirê gulleyan hate dayîn, û heya niha bi dehan kes ji xelkê sivil û nerazî yên wî welatî hatine kuştin û bi sedan kes jî hatine birîndarkirin û girtin û îşkencekirin.

Tund û tûjî û tepeserkirina nerazîyan bû cihê nigeraniya civaka navneteweyî û Saziya Lêborîna Navneteweyî daxwaz ji hikûmeta Îraqê kir ku dest ji serkûtkirina xelkê nerazî hilbigre, û hêlên internetê azad bike, û bersiva

daxwazên xelkê bi awayekî medeniyane were dayîn.

Xala herî girîng ya di wan meşên nerazîbûna xelkê Îraqê de ew e ku, rejîma Îranê bi sebebkarê tev wan alozî û nehametî û gendelî û kavilbûna welatê xwe dizanin û daxwazkar in ku navend û hêzên girêdayî vî rejîmê li welatê wan derkevin. Wek ji tev aliyekî re rohn û eşkere ye, ku bingeh û siyaseta rejîma Îranê û ya ku hertim rêber û rayedarên wî welatî dibêjin û pêdagiyê li ser dikin ew e ku, şer û alozî û peşqelên agir bibin nava malên cîranan, û bi çekirina pevçûn û têkdana tenahî û evlehiya herêmî, bala cîhanê bikêşin ser wan, û raya giştî bi wan aloziyan mijûl bikin da ku raya giştî dêna xwe nede ser rewşa aloz û bêdadî û tepeseriya hundirê Îranê.

Bi dirêjahiya temenê deshilatariya rejîma Îranê hertim di hewla têkdana tenahiya herêma Rojhilata Navîn de bûye, û bi siyaseta destêwrdana di nava karûbarên welatên cîran û herêmê û saportkirina girûpên terorîst û milîşiyayên girêdayî xwe ve, bûye sebebê şer û kavilkirina welatên weke Îraq, Yemen, Sûriye, Efxaniştan û... hwd, û stratêjî û siloganên weke hinardekirina şoreşê bo derveyî welat û xewna împatoriya cîhana Îslamê a rayedarên wê rejîmê bûye hegera malwêranî û kavilbûna herêma Rojhilata Navîn û herwisan qurbanîkirina xelkê Îranê di pêxema wê siyaseta xwe a dujminkarane de.

Di Îraqa piştî herifîna rejîma "Sedam Husên" rejîma Îranê di vî derfeta han û wê valahiya ku di encama siyaseta şaş a Amrîkayê de çêbû, her zû bi çekirin û saportkirina girûpên tundajo yên Şî'ê û girêdayî xwe ve, agirê şerê olî û tayifî û nemaze şerê navbera sunî û şî'eyan xweştir û geştir kir. Rejîma Îranê kerb û kîna xwe ya di serdemê şerê Îran û Îraqê de, bi siyaseta xwe ya dujminkarane, welatê Îraqê



xişte nava agir de, û jêrxana abûrî ya wî welatî bi tewahî herifand, û piştî jî bi çekirina mezintirîn girûpa terorîstî a DAÎŞ'ê û saportkirina wê girûpa han, bûye sedema kuştina bi hizaran kesên sivil û kavilkirina gund û bajarên wî welatî û nemaze di bajarên Sunînişîn de, û tev pîroziyên vî welatî teqandin û bi hêjmûnî û dagîrkirina dam û dezgehên serbazî û evlehî û îdarî yên wî welatî û çekirina girûp û milîşiyên weke Heşda Şe'ibî û ên din, agirê şerekî malwêranker a olî û tayifî û îdolojîk çê kiriye ku vemirandina agirê han tenê bi derxiştina hêzên Îranê û yên girêdayî Îranê di wî welatî de û herwisan herifîn û jinavçûna rejîma îslamî a Îranê bi dawî tê.

Siyaseta dujminkarane a rejîma Îranê ne tenê di herêma Sunî û Şî'eyan de, belku di çend salên derbasbûyî û bi geşekirin û pêşveçûna Başûrê Kurdistanê di warê abûrî û siyasî û dîplomasî de û herwisan roj bi roj birojevîrbûna doza berheq a gelkê Kurd di asta herêmî û cîhanî de, bibû cihê nigeranî û xeyidîna zêdetir a dagîrkerên Kurdistanê û yek ji wan dewleta Îranê û lewma bi tev hêz û qaveta xwe û bi darêtina kompilo û pîlanên şerxwazane, hewla çekirina nakokiyên zêdetir di navbera rayedarên Herêma Kurdistanê û Bexdayê didan. Ew pîlana han bi rêberiya Qasim Silêmanî û Spaha Pasdaran û dagîrkerên Kurdistanê di êrîşa bo ser Kurdistanê a di dema birêvebirina refran-

doma serbixweyiya Kurdistanê û hewla ji bo têkdan û jinavbirina qewareya siyasî û îdarî a Herêma Kurdistanê zêdetir ji bo raya giştî dixûye, û tê îsbatkirin.

Lewma ya îro rojê ji silogan û daxwazên berheq yên xelkê Îraqê ve dixûye ku gelên wî welatî rejîma Îranê bi sebebkarê sereke yê wan nehametî û alozî û malwêraniya welatê xwe dizanin, û daxwaz dikin ku welatê wan bi îradeya raserast a xelkê Îraqê ve birêve biçe, û îdî rê bi Îranê nehê dayîn ku ji vî zêdetir îrade û serweriya axa wan binpê bike û welatê wan kavil bibe. Li vir raştiya han ji hemî demekê zêdetir dixûye ku rejîma Îranê hegera sereke a tev wan şer û malwêraniyên di herêmê de ye, û heya ev rejîma li ser kar bimîne, wê şer û alozî û peşqela agirê olî û tayifî geş û geştir bibe, û cîhan bi giştî hêminî û tenahiye bi xwe ve nabîne.

Em îro şahidê vî yekê ne, ku bêzarî û diruşmên li dijî Îranê û siloganên neman bo rejîma terorîst a Îranê, ne tenê di civatgeha Îranê belku di hemî cîhanê û nemaze di nava welatên bêzarbûyî ji siyasatên destêwrdana rejîmê di nava karûbarên wan de jî tê bihîştin, û ew hawar roj bi roj bilind dibe, û pîroziyên wê rejîmê her roj dikevin ber agirê kerb û bêzariya xelkê herêmê û tîn şevitandin. Êdî destpêka herifîna rejîma Îranê li her derê dest pê kiriye, û rojên geş li pêşiya me ne, û wê gelên Îranê û cîhanê ji destê zordarî û şerxwaziya rejîma Îranê rizgar bibe.

Pêvajoya nakokiyên navbera Amerîka û rêjîma Îranê di qonaxa nû de



Azad Kurdî

Piştî ku Trump wekî Serokê Amerîka hate hilbijartin, nakokî û dijberiyên rejîma Îranê û Amerîka bi derbasbûna demê zêdetir û micidtir bûn. Lê heta niha Amerîka stîratêjiyeke zelal û bi bandor ligel kiryarên pêdivî li hember Îrana têkder û alozî xulqên li herêmê nîşan nedaye.

Rêveberiya Trump bi derketin ji lihevhatina welatên 5+1 li ser pirsê etomî ya Îranê, derbeyeke giran li Îranê xist. Mîna ku aveke sar li ser asineke kel dakî. Welatên berejewendîxwaz yên Ewropayê jî di lihevhatina xwe de ligel Îranê man. Ev pirs piştî vê yekê hat ku rêveberiya berê ya Amerîka bi vê lihevhatinê, destê rêjîmê di warê aborî de xurt û vekirî kiribû û Îranê jî bi pereyên ku bideşt xistibû, hemû Rojhilata Navîn pê aloz kir, bêy ku biçûktirîn sermayeyek bo xizmetkirina xelkê xwe mesref bike. Rêjîmê qadên şer li Yemen, Iraq, Lubnan, Sûriye û ... bi wan pereyan germ diki. Duyemîn derbeya herî giran û bi bandor ku Amerîka ji rejîma Îranê xist, ambargoyên herî tund û berfireh bûn li dîroka 40 saliya temenê desthilatdaroya rêjîma Xomêynî ku rêjîm matmayî kir. Weke dorpêç û ambargoyên ku Amerîka di dehsala 90an de xistin ser rêjîma Bees a Iraqê bi serokatiya Sedam Husên û di dawî de bi nemana Sedam û hîloşîna rêjîma Bees bi dawî hat.

Daxuyanî û helwêstên karbideştên Amerîkî yên vê dawiyê gellek nîqaş û guman jî çekirine li cem şirovekarên siyasî. Ya ku xuya ye, Amerî-



ka bi van zext û amargoyan naxwaze rêjîma Îranê lawaz bike û biguherîne, dibêjin em dixwazin liv û tevgerên rêjîmê biguherînin û wan bi neçarî bikişînin ser maseya got û bêjan. Mercên Amerîka jî bo rêjîma Îranê tenê wateya man û nemanê. Lewma her diçe nakokiyên navbera wqan zêdetir dibin.

Ambargoyan bandora sed ji sedî kiriye ser aboriya Îranê û hemû warên jiyan û rêveberiya wî welatî ji kar xistiye. Lewma hêrsbûn û bêhêvîbûn û nîşaneyên teslîmbûnê li daxuyanî û axavtinên wan xuya dibe. Lê Amerîka jî dizane ku rêjîma Îranê dixwaze di vê pêvajoyê de fêlan bike û weke berê dem û zeman bikire heta bikare xwe rê bixe û nêzîkî armancên xwe bibe, ev yek mijarek e ku hemû pîspor û şarezayên siyasî ku rêjîma Îranê bi başî nas dikin, li ser de hev-fikir in. Dilê rêjîmê bi vê yekê xweş e ku dema serokatiya Trumpê Komarîxwaz û dijberê Îranê hindik maye, belkî bi afirandina hinek pisrgirêkan û mijûlkirina rêveberiya Amerîka bi wan pirsan ve, bikare bandorê bike ser pêvajoya hilbijartinên 2 salên tê yên Amerîka. Helbet beşek ji welatên Ewropî jî bê meyl nînin ku Trump neyê hilbijar-

tin û ew rêjîma Îranê weke berê bona berjewendiyên xwe bikar bînin, ji aliyê din jî çavên xwe li hemû kiryar û xirabkariyên rejîma Îranê li herêmê bimiçînin. Bêy ku bo wan girîng be rêjîm li navxwe çî tîne serê gelên bindest li Îranê !

Stîratêjiya Amerîka li hember kiryar û siyasetên rêjîma fêdamental a Îranê bersiver nînin, dijkiryar bê bandor in, ji ber ku bîngeh û hişmendiya vê rêjîmê îdeolojiyeke hişk û teng a Welayet Feqîhî ye ku serederîkirin pê re biwêriyê dixwaze. Îranê bi êşkere beşeke sereke ya Rojhilata Navîn aloz kiriye û dixwaze hêleke berfireh a welatên Şîe meseb bihêz bike û bibe serkêşê wan. Bona vê yekê Pasdarê terorîst Qasim Silêmanî wekî Fermanderê Sipaha Quds a terorîst li ser navê Sipaha Quds û dehan grup û saziyan li çend welatan çalakîyên êşkere dike û ferman û biryarê jî tenê li Xamineyî yê rêberê olî yê rêjîmê werdigire. Vê yekê Amerîka bi tundî nigeran kiriye. Lê heta niha Amerîka nekariye bi başî destên rêjîmê kurt bike.

Destêwerdanên rêjîmê li herêmê û gefên berdewam û heta hêrişê wan b'oser binkeyên petrola Erebiştanê û gemiyên hilgîrê petrolê û rehîngirtina wan û ... Amerîka bi micidî nigeran kiriye. Ya ku xuya ye, Amerîka dixwaze Îranê bi zext û ambargoyan neçar bike dest ji destêwerdan û afirandina aloziyan li herêmê li dijî berjewendiyên Amerîka û hevalbendên wê kurt bike. Lê bi awayê ku Amerîka daye ber, nikare destêwerdan û zêdegaviyên rêjîma Îranê kontrol û kêmkir bike. Divê bi micidî helwêstê bigire, bîngeha fikrî ya desthilatdarên Îranê vê yekê dixwaze.

Îran mojûl e hemû çekên xwe bikar tîne da ku hinek paşekêşeyê bi Amerîka bide kirin, lê Amerîka jî dizane, vê carê ger li pêşberî rêjîmê paşde vekîşe, dê encamên gellek xirabtir ji dewrana Obama bihên serê Amerîkayê û berjewendiyên wan dikevin metirsiyeke micid. Taktîkên Amerîka bona lawazkirina rêjîma Îranê herçiqas dilxweşker nînin, lê nakokî û dijheviyên navbera wan dê li mehên pêş bibe mijara herî girîng a rojevê. Lê ev yek xuya ye ku heta rêjîma Îranê a fêlbaz bimîne, Rojhilata Navîn ewlehiyê bi xwe ve nabîne. Lewma stîratêjî û siyasetên wek Ewropîyan ligel Îranê, tenê temenê desthilatdariya wan a zordar û gemar a rêjîmê dirêjtir dike û destê rêjîmê jî bona serkut û qirkirinê berfirehtir bike li navxwe .

Tenê ji bo “aferîn”ekê bela dianîne serê girtiyan



N: Bûbê Eser

Gardiyan:

“Êdî derdekî nuh û îşkenceyeke taybetî dest pê kiribû. Gelek dawayên girtiyan hatibûn vekirin. Girtî êdî divê biçûna dadgehê. Birin û anîna wan, ne ewqasî rehet bû. Gelek kes hebûn ku bi salan di wir de razabûn, gelek li benda vekirina doza xwe bûn. Loma carna gelek kesan ji me re digotin “komûtanê min, dema doza min vebe, ez ê bême berdan, tu sûçê min tune”. Lê me ji tu kesî bawer nedikir.

Girtiyanan dizanîbûn ku di encama dadgehê de wê gelek bêne berdan. Girtî bi hêviya ku wê bêne berdan, li benda dozvekirina xwe diman.

Ew roj jî hat, wan tu carî bawer nedikirin ku di wê rojê de jî em ê li wan bidin û êşkenceyan bi wan bikin. Ew difikirîn ku hema doza wan bê vekirin, her tişt xilas dibe. Lê nedifikirîn ku yuzbaşiyê me jî li benda vekirina dozên wan bû. Di demên hatina îddî’anemeyên (ew kitêba ku girtî bi kîjan sûcî têne dari-zandn) wan de wê çi bihata serê wan, wanê ji ku zanîbana. Tenê wan dixwestin ku rojekê berî rojekî dozên wan bê vekirin.

Dema îddî’anemeyên girtiyan dihat girtîgehê, berî ku girtî wan bibîne, îddî’anemeyên wan ji alî yuzbaşiyê me “Esat” ve dihatin xwendin. Wî ew kesên rêxistin damezrandibûn, ew kesên ku leşker an jî polîs kuştibûn, navê wan yek bi yek li ba xwe dinivîsî. Piştî ew kesên weha, wî bi xwe li girtîgehê îfade ji wî/ê digirt û li gor wê, mu’amele pê re dikir. Li wan dida, îşkenceyên gelek ecêb dianî serê wan.



Ew girtiyên di rewşên weha de tenê du rê li pêşiya wan hebûn. Ya wan ê daxwaza yuzbaşî pêk baniyana û tiştên ku wî dixwest bini-vîsandina, ya jî ew kes wê di wirde bihatana kuştin. Ji bilî van her du rêyan tu xelasiya kesên li girtîgehê dihatin mahkemekirin tune bûn. Bi saya sedema dawavekirina girtiyan yuzbaşî hin kesên bi cezayê mezin dihatin îthamkirin xîste bin êşkencên taybetî ku kesên weha her tiştî jî wî re bêjin.

Wî hin teslîm girtin. Wan daxwazên yuzbaşî pêk anîn û nivîsên xwe li gor dilê yuzbaşiyê me nivîsin. Ew kesên weha ji çendên mirovên tirsonek pêk dihat. Piraniyan kesên sûcê wan gîran li hember wê lêdan û êşkenciyên me bi wan dikir, radiwestiyan û tu tişt ji yûzbaşî re nedigotin. Eksê wê li dadgehê her bûyerên ku me di girtîgehê de dikir li wir digotin. Gelek girtiyên ku berê di nava rêxistinên xwe de berpirsiyar bûn. Ya jî gelek kesên sûcê wan giran bûn. Yuzbaşiyê me ew ji qawişê wan derdixistin, dibir hucran, bi rojan li wir bê nan, av û cixare dihiştin. Dawiyê kaxezeke dida wan û digot:

-Binere mezinê vir ez im. Ji min mezintir kes li vir tune ye û kes nikare têkilî nava karê min bibe. Ez çi bikim azad im. Berdana te û cezakirina te jî di destê min de ye. Li gor ku min îddî’anemeya te xwendiyê, bi kêmanî tu yê 30-40 salî ceza bixwe. Bêî ku ez lêdanê li te bikim, serpehatiyên xwe, karûbarê

xwe yên rêxistinê yek bi yek binivîse. Di binê kaxeza xwe de jî bêje ku “ez ji hertiştê ku min kiriye poşman im”. Wê demê ez karim te bidim berdan. Na, eger tu tişteki weha nenivîsîne, tu zane ku tu ê nikaribî ji vir bi saxî derkeve.

Êdî ez diherim. Dema te dest bi nivîsê kir, xebera gardiyana bighîne ku bila ew ji te re çay, av û xwarina xweş bînin. De hadê êdî tu dizane, ya mirin yan jî azadbûna te, her tişt di destê te de ye. Ji herduyan yekê hilbijêre.

Bi rastî jî tiştê ku yuzbaşiyê me digot, pêk dianî. Hin kesan ji bona di wir de neyên kuştin, hin tiştên ku baweriya yuzbaşî pê dihat dinivîsîn, dema ew diçûn dadgehê ew tiştên ku di girtîgehê de nivîsî bûn, înkâr dikirin û digotin:

“Min ew tiştên nivîskî bi darê zorê nivîsî ye û ji xwe hemû derew in. Ji bona ku ez di girtîgehê de neyême kuştin, ji bona ku ez wan bûyerên di wirde dibin bêjim, min hin tişt nivîsîn. Niha ez di huzûra we de dibêjim, heger ez di girtîgehê de bême kuştin, qatilê min yuzbaşî Esat e”.

Belê me gelek kesên weha mîrxas jî di wê girtîgehê de dîtin. Hin mîrxas hebûn ku mirov li rewşa wan ecêbmayî dima. Ne ji lêdanê ditirsîyan, ne ji girtîgehê û ne jî ji yuzbaşî Esat. Lê hin kes hebûn ku nava wan ji lêdanê diqetiyên. Ji xwe kesên weha bûne zîlamên yuzbaşî û kesên weha bûn ku ji bona lêdan li wan neyê kirin “îtîrafa samîmî” dikirin. Hin ji wan kesan, êdî li dadgehê

jî li hevalê xwe didan û ew bi her awayê dibûn merivên yuzbaşî. Yuzbaşî jî bi her awayî li wan xwedî derdiket; Li girtîgehê kesên weha di jiyanêke taybetî de bûn. Xwarin, vexwerina wan ji kîsê yuzbaşî bû. Car-carna yuzbaşî ew ji girtîgehê derdixistin, bi ku de dibirin me pê nizanîbûn.

Ew tiştên ku yuzbaşiyê me bi darê zorê, bi hin girtiyan dida nivîsîn, navê wê kiribûn “îtîrafname ya samîmî”. Lê ew bi xwe ne “îtîrafa samîmî” bû, ew bi xwe qebûlkirina bi hukmê dar û jopan dihatê kirinê, bû.

Di girtîgehê de, cihên cûda cûda ji bona lêdana girtiyan û gelek medotên bi taybetî hebûn. Li gor sûc û cezakirina girtiyan me ew dibirin cihê ku cezayên wan dihatê birrîn. Weke; lêdana di hucran, ya qawişan û lêdana bi taybetî ya li sinema û hemamê ne weke hev bûn. Li her cihekî şiklekî lêdanê hebû.

Jiyana me ya di wir de bû bû weke jiyana kerr û lalan. Ne me dizanîbû ku em çi dikin û ne me rojekê devên xwe vedikir. Me her emirên ku ji terefê yuzbaşî de dihat pêk dianî û gelek caran jî ji bona aferîmekê me mirov seqet dihiştin. Ew aferîma ku me li girtîgehê digirt, li vir yanî li jiyana me ya siviltiyê de, li me bû weke pariyekî bijehr û di qirika me de ma.

Em ji her tiştên xwe bûn, ji doşt û hevelan, dê û bavê xwe, xwişk û birayên xwe bûn. Lê rojekê ji rojan ne deweleta me, ne jî ew kesên di girtîgehê de digot; her tişt ez im. Li me ne pirsîn. Kes nabêje “gelo ew kesên li girtîgeha Diyarbekirê de gardiyan bûn, niha halê wan çi ne?”.

Tu bi rastî bixwaze divê her kesekî ku li wê girtîgehê gardiyan bûn, ew kiryarên wan bi xwe kirine bêjin, bêjin ku êdî tu kesên din

»»» Doma R:5

neyên xapandin. Tu kesên din jî weke me fikir, nekin. Ji ber derewên kesên li wir soz didan ku wê her dem li me xwedî derkevin.

Di jiyana me ya sivilîtiyê de derket holê ku wan sozên xwe neanîn cih. Ji roja qedandina me ya leşkeriyê de em hatin jibîrkirin. Lê hin

kesên weke yuzbaşî, bi saya serê lêdana ku me li girtiyan fikir, mezin dibûn. Terfîyên wan î leşkerî bilindtir dibûn. Ma gelo rewşên weha wê heta kengî dom bikin. Em mirovên nezan, gelo heta kengî em ê bêne xapandin.

Gardiyan him digot û him dibû kufe kufa wî, soro moro bû. Min fêhm kir ku dema tiştên wî bi xwe kirine têne

bîrê gelekî aciz dibe. Nîkarîbû êdî qisedana xwe bi-domîne. Him cixare dikişand him jî di nava ramanên kûr û hûr de xwe wenda kiribû. Hêstirên wî yên girover xwe ji çavên wî bera xwarê dida. Wan hêsiyan di ser çenga wî re, xwe bera ser sînga wî didan.

Devê xwe vekir ku tiştina bêje, serê xwe hejand û di

ber xwe de got: “wax wax, xwelî li serê min be, ma min çawa kir, tif û hezar tif li min be”. Ji vê pêve tu tiştêkî din negot, rabû ser xwe, kete rê û çû. Qet ji min re tu tişt ne-got, min jî weha bi awayekî şaşmayî li rewşa wî mêze kir. Min jî ji wî re tu tişt negot, tenê heta ew jî ber çavên min wenda bû, min li wî nerî. Dû re ez rabûm ser xwe, min jî berê xwe da malê.

Sedem çiyê ku xelkê nerazî li Îranê de yekgirtî nine?



N: Nûredîn Sofîzade

Li Îrana bela lêdayî de, û li nava qatên curbicure civatgeha wî Welatî dejî her weke zaf Welatê dine, arise hene û mafê xelkê Welatê Îranê çend qat zêdetir ji yê xelkê Welatên din tete bînpêkirin.

Rejîma Îslamî ku ewa 40 salê bi heçî avayekê zulm û sitema xwe bi ser xelkê de sepandiye, piraniya xelkê Îranê û bi taybet Netewên bêmaf ji heçî mafekê bêbar kirine.

Xelkê Îranê li pêkhatên cuda de nerazîne û ji deşt sitema rejîma Axundî dinalînin, gava mirov mîzeyî kîjan qatê ji civatgeha Îranê dike, ji deşt vê rejîmê vîzar bûye û bona eyana nerizayetiya xwe jî li benda derfetekêye, lê mixabin ev aliyê civakê ku li ser peqînêne, heta vê gave jî êk girtî ninin.

Kirêkar mane digrin û nerizayetiye didne xuya kirin, qatên din xwe mat dîkin, gava rejîm tenê kirêkaran dibîne, gelek sanahî wan tepeser dike.

Em naha rojane şahidê kom bûn û nerizayetiya parek ji

xelkê Îranêne û kîjan para tê meydanê mixabin xwe tenê dibîne, Jin, bazarî, xwandîkar, kirêkar, mamosta, werzîgar, mixabin çî êk ji wan pîrsa qata din bi ya xwe nizane, êdî fikrê ji hindê jî nake ku sibê dora wane jî.

Ewa çend roje xelkê Bajarê Lordganê li henber dujminkariya rejîmê de deşt kirine bi xwenîşandanan û eyana nerizayetiye, li ber evê ku xwe tenê dibînin û heta vê demê jî çawê wan jî xîret û piştîvaniya xelkê seranserî Îranêye, ku mixabin heta naha jî her tenê ne û xelkê Îranê xwe bê deng kirine, lewma rejîm jî bi avayê herî bêrehmane wan tepeser dike û bi lêdan û girtin û tepeseriye li cehda mat kirina dengê xelkê Lordganê de ye.

Xelkê Îranê dibe baş vê êkê bizanin ku hekî Îro rejîm jînosayde li ser xelkê Lor birêve dibe, bê guman li pêşerojê de dor dê bigîje Belûcan, Kurdan, Azeriyan, Ereban, Tirkimenan û xelkê bajar û deverên dine jî. Rejîm baş hayîl vê rewşê bûye lewma ewa ji deşt têt bi dijî xelkê Îranê dike. Heta xelk êk deng nebe, heta gava kîderê rejîmê parek ji xelkê tepeser kir û hemi xelkê Îranê jê xwedî dernekewe, bê guman ewa dê hale Îran û Îraniyan be.

Rejîm bi êşkere jînosada hewşeweya Holokaştê li ser xelkê Îranê encamp dide, civatgeha Îranê herifandiye, sedan derd û bela inane sere xelkê, xelkê Îranê bi avayekê tûşî nesaxiye kiriye bê guman hekî hankî here pêş,



êdî li pêşerojê de kesê hêza berewanî kirina ji kerameta xwe namîne.

Gelek kêmxelkê dur bela û saxlem li Îranê de mayê, mixabin ewa rejîmê dixwaşt geheştîye.

Rejîmê dehan cuên nesaxiye belav kirine ku renge tuş kirina xelkê Çinar Mehmûda Lordiganê ya herî dawî be, Nesaxiya Îdz, tuş bûn bi madeyên hişber, bê karî, leş firoşî, dizî, rişwet xwarin, telaq, pars kirin, hewar birin bo ser satlên kirs da ku xwarinê peyda bikin, xwe kujî, û ewane jî hemi bûne sedem ku piraniya xelkê Îranê ji fikir kirina ji azadî û berewanî kirina ji mafên xwe bikewe û bê helwêst be û heki gotî hemi roj reşî û malvêraniyekê qebûl bike.

Raştiya bûyerên Lordganê ewaye ku 2 mehan berî naha parek ji xelkê Gundê Çinar Mehmûd ji tenduriştiya xwe nîgeran bûn, piştî evê kû ceribandin anku azimayêş li ser xwîna xwe kirin, zanîn ku piraniya xelkê gund tûşî nesaxiya” H I V” Îdzê bûne. Piştî lêkolîn û bi dû kewtinê îşbat bû ku Îdara Bêhdaşt wî Gundî ji Sorengêkê mifah wergirtiye ku hilgirê Vîrusa

Îdzê bûye. Her bi du vê êkê jî êşkere bû ku Îdara Bêhdaşt wî Gundî sedan Surengên din ku ev jî her pîs bûn bi nesaxiya Îdzê, li devruberê Gund belav kirine.

Xelkê Gundê Çinar Mehmûd bona jê pîrsîn û bi dude çona wê pîrsê çune ber derê binkê Tendurustiya wî Gundî lê çî bersivek wernegirtin, lewma ev pîrse bal xelkê cihê nîgeraniye bû û heta ku rejîm û Îdara Bêhdaşt rejîmê xwe li henber saxlemiya xelkê de bi berpirsyar bizanin.

Rejîmê bersiva daxwaza xelkê bi tepeserî û gef û girtin û êrişê da. Lewma xelkê Lordganê êriş kirne ser dem û dezgehên rejîmê û şevitandin û ewa çend roje şer û pevçûn berdewame.

Hewceye hemi xelkê Îranê ji xelkê Lordiganê xwedî derkewe da ku sibê rejîm nekare wêne xirabtir li cihên dine bîne sere xelkê Îranê.

Xelkê ku li henber çarenivîsa xwe de bê deng be bê guman xwe qebûl kiriye ku xwediyê kerameta xwe nebe, lewma dibe êk carî rabin bo hemi care da ku wê rêjîmê û sîbera reşe wê li ser xwe kêmxelkê bikin û bibne xwediyê jiyanê jêhatiyê serdem.

Nerîna Lîderan




Donald Trump:

“Hesen Rûhanî got hekî parek li tehrîman li ser me rakin emê gotûbêjê bikin, lê min qebul nekir.”.



Israel Katz:

“Em dibe îro rojê rejîma Îranê bisekinînin, daku di paşerojê de ti şerek pêşira ti welatekî negire”.



Muqteda Sedir:

“Dibe hikûmet pêşî li gendeliyan bigre û pêbend be bi daxwazên xelkê nerazî”.



Mihemedcewad Zerîf:

“Ewropa nikare li Bercamê bê derê”.

Li bendê ye Kurd careke din hilbijartinan baykot bikin



N: Eskender Ce'iferî

Kurd li Kurdiştana Rojhilat ji deştpêka temê Komra Îslamî ve, hilbijartinên vî rejîmê baykot dikin û take dujminên rejîmê ne ku hertim di rêbaza xwe de mane.

Çalakvanên Kurdiştana Rojhilat, mînaka herî berçav a nedana azadiya neteweyan, girtin yan jî rênedan ji bo weşandina herî kêm 25 kovar, belavok û heftenameyên Kurdî tînin ku di serdema Hesen Rûhanî serokkomarê niha e Îranê de hatine girtin. Ew, amaje dikin ku bûdceya saziyeke navçeyî a ser bi rêkxistinên ewlehî û îstixbaratî ên rejîma Îslamî a Îranê, ji bûdceya çap û weşana Kurdî zêdetir e. Tenê ew pirtûkên Kurdî û ew rojname bi bûdceya dewletê dikevin ber deştê xelkê ku di berjewendiya rejîma meleyan de ne.


Niha hiklbiartinên Meclîsa Îslamî a rejîmê nêzîk dibin û li bendê ye ji ber berdewamiya bînpêkariyên mafên netewî û mafên mirovan li Kurdiştana Rojhilat, careke din partiyên Kurdî bi hevdengî, vî hilbijartinê baykot bikin. Kurd dizanin ku reformxwaz jî li hemberî Kurdan weke ên din in. Mehmûd Ehmedînîjad jî weke Rûhanî serokkomar bû. Ne çar salan lê heşt salan. Aştî azadiyê li wî welatî heya rêjeyeke herî kêm da ketibû. Lê dîsa jî hin Kurd peyda bûn beriya ku navê wî derkeve yan jî bê redkirin, bi kincên xwe ên bav û kalkan, piropagende ji wî kesî re kirin ku biryara darvekirina sedan ciwanên Kurd di serdema serokkomariya wî de hatibû standin.

Li cem Kurdan, berendamê Komara Îslamî, nikare berendamê xelkê be. Li vir

behsa redkirin yan jî erêkirina selahiyeta berendaman ji aliyê Komara Îslamî ve nayê kirin. Lê belê behsa baykotê û beşdarînekirin di piroseya dengdanê de germtir e. Opozîsyona Îranî, ji a Kurdan cuda ye. Hin ji wan, hiklbiartinan baykot dikin, hinek bîdeng dimînin û hin jî beşdar dibin. Hinek jî hene bi awayekî veşartî tevî piroseyê dibin. Lê partiyên Kurdî ên Rojhilat, dengêkî cuda hene. Ew ji serdema Dr. Ebdulrehman Qasimlo ve ku ji aliyê Komara Îslamî ve hate tîrorkirin, hemû hilbijartinan baykot dikin.

Herî dawî di hilbijartinên serokkomariyê de bû ku şeş partiyên Kurdiştana Rojhilat bi daxuyaniyekê di derbarê hilbijartinên serokomarî û encûmena gund û bajarên Îranê de biryara boykotkirinê dabûn. Wan aliyan ragihandibûn ji ber ku ev hilbijartin di rewşeke ne demokratîk û ne azad de tîne lidarxistin, ewê wan boykot bikin. Wan gotibûn ne di hilbijartiên gund û bajarên de û ne jî di a serokkomariyê de, berendam bi şewazekî demokratîk neketine holê ji ber ku selahiyeta dijberên Komara Îslamî tê redkirin. Herwiha wan aliyan ji Kurdên wî perçeyî jî xwestibûn ku roja hilbijartinên wî welatî neçin ser sindoqan û dengê xwe bi kar neynin. Ew şeş alî, Partiya Demokrata Kurdiştana Îranê (PDKÎ), Partiya Komunîst a Kurdiştana Îranê, Komeleya Zehmetkêşanên Kurdiştanê, Hizba Demokrat a Kurdiştanê (HDK), Komeleya Şoreşger a Zehmetkêşanên Kurdiştana Îranê û Komele-Rêxistina Kurdiştanî ne. Niha çar ji wan aliyan, Navenda Hevkariyê a Partiyên Kurdiştana Îranê ava kirine û li bendê ye bi awayekî hevdeng, van hilbijartinan baykot bikin.

Hin aliyên biçûk ên ku ti bandoreke wan a berçav jî li Kurdiştana Rojhilat tine ye, di hilbijartinan de hertim dibêjin pêwîst e xelk beşdarî hilbijartinên encumenên gund û bajarên bibin ji bo




ku kesên xwedî şîyan bibin rêveberên gund û bajarên. Lê aliyên herî bi bandor ên weke Komele û PDKÎ, hertim dibêjin berendam ji filteran derbas bûne û ti yek ji wan serbixwe nîn in da ku bikaribin mirovên azadîxwaz yan jî demokrat bin.

Di dema piropagendeya hilbijartinan de hem bazara zîmanê Kurdî germ dibe û hem jî çand û sembolên Kurdî. Eger lixwekirina kincên Kurdî ji bo wan kesan tê qebûl kirin ku piropagendeyê ji bo berendaman dikin, lê bi ti awayekî ji bo jîna ku dixwast bi kincên Kurdî here Wezaretê Navxwe da ku navê xwe weke berbîjêr tomar bike, nayê qebûl kirin. Tevî ku bi siyaseta xapandinê, hewl tê dayîn da ku sembolên Kurdan ji bo piropagendeyê bi kar bînin, lê dîsa jî marmanca çewt a rejîmê ku xapandina raya giştî ye, derdikeve holê. Ji ber ku êdî di vir de mafê jîna Kurd, du caran tê bînpêkirin. Carekê weke jin û carekê jî weke Kurd. Eger ti caran derxistina stranên Kurdî di beşa mûzîka zanîngehan de nayê qebûl kirin, lê ji bo wan hunermenên qebûl kirî ye ku bi stranên Kurdî piropagendeyê ji bo berendamên hilbijartinan dikin. Partiyên ku hilbijartinên gerra berê a serokkomariyê baykot kiribûn, dabûn xuyakirin ku take rê ji bo demokratîzekirina Îranê û dabînkirina mafên netewî ji bo Kurdan, guhertina sîstema Îranê ye û li gor ku ew dibêjin, di yasaya bîngehî a wî welatî de ne mafê jînan parastî ye, ne e karkeran û ne jî mafê ol û neteweyên cuda.

Eger Kurdek li benda guhertineke bîngehî di çarçoveya Komara Îslamî de be, dişube kesekî ku li ser kaniyeke hişk û zuha, li benda avê ye.

Rojavayê Kurdistanê di navbera herêma ewle û destûrê de



N: Ebdulêzîz Qasim

Piştî bêhtir ji 8 salan ji şerê navxweyî li Sûriyê, ji aliyê Sekertêrê Giştî yê NY “Antonio Guterres” li 23’ê Îonê, komîteya nivîsandina destûra Sûriyê hat ragihandin, ku îro pirsê destûrî li Rojavayê Kurdistanê digel pirsê herêma ewle û gefên Tirkîyê di rojevê de ye.

Tê zanîn ku Rûsya ji demê dirêj ve hewl dide pirsê destûrî li Sûriyê bide pêş dosyên din yê biryara 2254, ku reşnivîseke destûrî jî amade kiribû, lê îro bi rêya dewletên Aştana ku Tirkîyê û Îran di nav de ne û bi piştgiriya NY, pirsê destûrî ket di rojevê de, û niha ji aliyê (NY), komîteya destûrî ji 150 kesayetîyan hat avakirin, ji wan 50 kes ji aliyê NY hatin destnîşankirin, 50 nûnerên rejîma Sûriyê û 50 nûnerên opozîsyonê ne, û di nav de ENKS bi du nûneran beşdar dibe.

Li gorî biryara 2254 ya NY di sala 2015 de ku divê makezagon paşî dirîstkirina hikûmetê demkî were nivîsandin, ku biryara 2254 jî çar dosyan pêk hatibû: (1-Hikûmeta veguhêz “demkî”, 2- destûr, 3- hîlbijartin, 4- jinavbirina terorîzmê). Ya xuya ye ku Rûsya bîlez e û dixwaze pirsê destûrê bide pêş, tevî ku heta niha erkê komîteya destûrî nehatiye diyarkirin, rejîm jî aliyê xwe ve dixwaze destûra sala 2012’an serrast bike û opozîsyon berevajî daxwaza nivîsandina destûreke nû dike, û tê pêşbînîkirin ku rejîm jî aliyê xwe ve hewl dide ji bo peydakirina aştengîyan li pêş nivîsandina destûreke

nû ji ber ku opozîsyon nikare 113 dangan ji 150 dengî misoger bike, lê tevî weha jî aliyên kurdî ditirsîn ku rejîm û opozîsyon li ser redkirina federaliyê û mafên netewî yê mîletê kurd lihev bikin, bi taybetî ku hejmongeriya Îran û Tirkîyê heye li ser opozîsyon û rejîmê, û ev yek bû sedemê sereke li ser kêmkirina rêjeya nûnerên kurdan di Komîteya destûrî de, û hemû aliyên kurdî di nav de, Encûmena Niştîmanî ya Kurd li Sûriyê (ENKS) jî hejmara kurdan di nûneriya Komîteya Destûra Sûriyê de nerazî ne, û ENKS nameyek ji Sekreterê Giştî yê NY re şand û tede nerazîbûna xwe nîşan da, û daxwaza piştgiriyeke navdewletî ji doza Kurdî re kir, û hin dewletên Ewropî û Amerîka û rayedarên NY û bi taybetî Rûsya û Fransa piştgiriya xwe ji bo çareserkirina doza kurdî li Sûriyê piştraşt kirine, û li vir hêjayê gotinê ye di reşnivîsa destûra Sûrî de ya ji hêla Rûsya ve hatibû amadekirin, tede amaje bi mafê otonomî jî bo Kurdan kiriyê, û Wezîrê derve yê Rûsya Sergey Lavrov derbarê vê yekê diyar kir ku divê pirsê Kurd li Sûriyê bi diyalog û danûstandin li gel rejîma Sûriyê di çarçova yekparçeyî ya axa Sûriyê de were çareserkirin, lê helwesta Fransa cuda ye û niha bi destpêxeriyekê radibe ji bo nêzîkatiya ENKS digel PYD.

Hevdem digel pêkanîna komîteya destûrî bi piştgiriya NY, Tirkîya berdewam gefan bi êrîşkirina devera kurdî li rojhilatê çemê Firatê dixwe, piştî rêkeftina wê digel Amerîkayê di 7’ê tebaxa 2019’an de li ser herêmeke ewle li rojhilatê Firatê û pêkanîna gerên serbazî yê hevbeş li devera di navbera bajarê Serêkaniyê û Girêspî de, û dûrxistina hêzên Sûriya demokratîk (HSD) û (YPG) û çekên giran ji navçeya sînorî, lê tevî weha ku rayedarên Tirkîyê jî aliyê xwe ve rexneyan li Amerîka dîkin, û didin zanîn ku bernameya herêma ewle ne li gorî xwestê eke wan e û gefan dixwin



bi pêkanîna oparesyoneke leşkerî. Piraniya aliyên kurdî li rojavayê Kurdistanê kok in ku Tirkîya li dijî berjewendiyên Kurdan dixebite, û ku herêma ewle li gorî wê dagîrkirineke nû ye wek heman dagîrkariya li herêma Efrînê, û ji bo vê yekê ENKS di dema borî de serdaneke dîplomatiyê li çend welatan pêk anî di nav de serdana Moskow û Washington û çend dewletên YE kirin, û ji aliyê xwe ve nûnerê taybet yê Amerîkayê bo karûbarên Sûriyê “James Jeffrey” ragihandibû ku ew jî bo parastina kurdên Sûriyê dixebitin, hevdem ku aliyên kurdî ditirsîn ji guhertina demografiyê ku Tirkîya dixwaze 2 milyon penaberên Erebi li herêma kurdî li rojhilatê Firatê niştêcîh bike wek heman guhertina li Efrînê, û penaberên Sûriyê jî bo armancên siyasî dûr ji prensîbên mirovî bikar tîne, car jî bo guhertina demografiyê li Kurdistanê Sûriyê û car wek kerteke guvaştinê li ser “Europe”, û Serokê Fransa, “Emmanuel Macron”, derbarê vê yekê dabû zanîn ku Tirkîyê penaberan wek karta fişarê li dijî Ewropa û Yonaniyê bikar tîne û got ku divê li hember wê de stûyê xwe netewînin, û dabû zanîn ku siyaseta “Europe” li Sûriyê qet bi siyaseta Tirkîyê re hev nagire û nabe em ti carî fişarên Tirkîyê qebûl bikin, û berpirsê NY got ku projeyê bicîhkirina penaberan li deverên Kurdan projeyên Tirkîyê ye û NY digel wê nîne. Heta niha ti hûngilî jî aliyê Amerîka nînin derbarê

herêma ewle, û hêjî bazar di navbera Rûsya û Tirkîyê de û di navbera Tirkîyê û Amerîka de dibin li ser herêma kurdî û Idlibê, lê tiştê diyar ku berjewendiyên Amerîka li herêma rojhilatê çemê Firatê gelek mezintir in ji bazarên digel Tirkîyê û hin dewletên erebî û bi taybetî Erebiştana Si’ûdî li dijî destêwerdana Tirkîyê ne.

Roj bi roj xuya dibe ku çareserkirina pirsê Sûriyê di kêmkirina pêgeha Îranê û Tirkîyê de ye, nemaze ku Tirkîya niha bi awayekî aşkere girûpên terorîst li Idlibê û Efrînê diparêze û keleman çêdike di pêşiya hewldanên navdewletî de.

Piraniya çavdêrên siyasî dibînin ku çareserkirina pirsê Sûriyê ne di destê Sûriyan de ye, bi tevî rejîm û opozîsyona xwe ve, û dibînin ku di destê Amerîka û Rûsya û Îsraîlê de ye û dibe Fransa jî rolek taybet hebe di çareserkirina kirîza Sûriyê de, û li gorî dîtina gelek şirovekarên siyasî yê Kurd û Sûrî û bi taybetî ENKS dibînin ku kilîta çareserkirina pirsê kurdî wê li dawiyê bikeve di destê Hewlêrê de, û dibe rayedarên herêma Kurdistanê pirsê mafên gelê kurd di destûra Sûrî de û pirsê rojhilatê Firatê û bi taybetî pirsê Efrînê bi “Sergey Lavrov” re gotûbêj bikin, di dema serdana wî de ya ji bo Hewlêrê di rojên pêş de.

-Têbînî: Ew gota berî serdana Lavrov bo Îraqê hatiye nivîsandin

Li ser sînore bajarê Selmasê Kolberek hate birîndarkirin

Kolberekî Kurd ê bajarê “Selmas”ê, bi teqeya rasteraşt a hêzên Spaha Pasdaran hate birîndarkirin.

Li gorî rapora gihîştî bi Ajansa Nûçegihaniya “Kurdpa”yê, di çend rojên derbasbûyî de, Kolberekî Kurd yê bi navê “Vehîd Îsapûr”, kurê “Riza”, li devera “Şipîran” a girêdayê bajarê “Selmas”ê, bi sedema gulereşandina hêzên Spaha Pasdaran hate birîndarkirin.

Ew Kolberê Kurd, bi bê agehdarkirina berê, bi hegera şik bi hebûna tiştên qaçax, ji aliyê hêzên Spaha Pasdaran ve teqe jê hate kirin.

Her di vê derheqê de, roja



Sêsemî, 9`ê Rezberê, hejmarek ji kasibkarên Kurd di ser sînoren bajarê “Serdeşt”ê, bûne armanca gulereandina rasteraşt a hêzên Spaha Pasdaran û di encama wê gule reşandinê de, kasibkarek bi navê “Qadir Mihemedzade”, xelkê gundê “Toyjele” a bajarê Serdeştê, hate birîndarkirin.

Kolberekî Kurd bi sedema gulereşandina hêzên Spahê canê xwe ji dest da

Kolberekî Kurd ê xelê devera Mirgewer a ser bi bajarê Urmîyê bi sedema gulereşandina rasteraşt ya hêzên Spaha Pasdaran, di ser bilindahiya çiyayê Kêleşînê canê xwe ji dest da.



Pêka nûçeya ku gihîştîye Ajansa Nûçegihaniya “Kurdpa”yê, şeva Sêsemî 9 Rezberê, kolberekî Kurd ê bi navê “Ezîz Reîsî” û kurê Menaf û xelkê gundê “Girdîk” a ser bi devera Mirgewer a ser bi bajarê Urmîyê, di ser bilindahiya çiyayê Kêleşîn a ser bi bajarê Şinoyê canê xwe ji dest da.

Ew kolberê Kurd bi bê agehdarkirina berê raştî gulereşandina rasteras ya

hêzên Spaha Pasdaran hatiye û canê xwe ji dest da, û termê wî heya niha ji malbata wî re nedane.

Her di vê derheqê de, roja Duşemî 8ê Rezberê, kolberek Kurd yê bi navê “Adil Yeqûbî” yê temen 26 salî û kurê Sidiyq û xelkê gundê “Bîsaran” û rûniştîyê şehreka “Hicret” a ser bi bajarê Merîwanê, bi sedema teqîna mînê, pê wî yê çepê raştî şikestinê hat.

Hejmara destfiroşên Îranî di herêma Kurdiştanê de zêde bûye



Bi sedema nebûna kar di Îranê de asta destfiroşî di herêma Kurdiştanê de zêde bûye û kedkar û kasibkareke zêde rû li wî herêmê kiriye.

Kedkar û kasibkarên Îranê û nemaze yên Rojhilatê Kurdiştanê roj bi roj rû li herêma Kurdiştanê dikin. her di vê derheqê de Endamê Odeya Bazirganî Elî Şerîetî daye zanîn ku, di herêma Kurdiştanê de piraniya xelkê Rojhilatê Kurdiştanê di wî herêmê de mijûlê karin. Û eve jî vê yekê nîşan dide ku rewşa maliya wan baş e.

Herwisa navbirî gotiye: Di Îranê de bi sedema vê yekê ku xelkek bihanî bo geştyarî

rû li Îran dike, me di gel kompaniyayên bihanî rêkev-tin wajo kiriye ku ji bo sermayeguzariyê bo geştyariyê kedkarên bihanî jî digel xwe hundirê welat bike.

axavtinên wî berpîrsê di halekê deye ku bi sedema nebûna kar bo hevvelatîyên Îranî di welat de, xelk neçare ku rû li welatên cîran bike daku bikare bo xwedê kirina malbata xwe pareyekê der bîne.

Her bi wî sedemê jî welatîyên Rojhilatê bi sedema nebûna kar rû li Başûrê Kurdiştanê dikin, û demjimêran di bin germayê de, li ser şeqaman dirûnên daku karek ji bo wan peyda bibe.

Dubarebûna bêserûberiya bazara sêvan di parêzgeha Urmîyê de



Tevî hemû ew ziyanên ku welatî raştî hatine û ziyaneke berçav dîtine, wê carê jî bê serûberiya bazara sêv di parêzgeha Urmîyê de pêşîra welatîyan girtiye.

Her wekî hertimî îsal jî bazara sêvan pîrsgirêkek bo welatîyên parêzgeha Urmîyê çê kiriye. Tevî wê ku 60 hezar malbat di parêzgeha Urmîyê de bi rezên sêvan xwe xwidî dikin, û nêzî deh hezar malbat jî bi awayekî naraştexwû kar dikin.

Herwisa neşandina sêvan bo derveyê welat wisa kiriye ku, bazara sêvan di astekekî herî xirab de be, û wekî hertimî xwedîyên rezan sevên xwe wekî sevên jêr darî di ser şeqaman kom bikin û bi nîrxekî herî kêrî bifiroşin.

Piraniya welatîyên parêzgeha Urmîyê di vê derheqê de dibêjin: Tevî vê ku îsal zîrareke mezin gihaye rez û baxan, lê eve di halekê deye ku bastrin sêv dîsan jî, her sevên parêzgeha Urmîyê ne, û niha jî sevên me bi nîrxekî herê kêrî me dikirin.

Herwisa dibêjin, em her sal raştî wê pîrsgirêkê tînin û berpîrsên rejîmê jî, di vê derheqê de ti rêyekî bo çareserîya pîrsgirêkan nabînin.

Bi wî awayî, her dîsan wekî salên derbasbûyî, sevên darê yên welatîyan di destên wan de mane û eve jî rêyan bo rejîmê xweş dike ku bi nîrxekî kêrî berhemên welatîyan bikire, rejîm ne tenê pîrsgirêkên wan çareser nake, belkî îstîsmarê jî, ji wan dikin.

Kultur û kuştin




N: Efşar Gêçeyî

Kultur di wateya xwe de, livîn yan hizirkirin mirovek yan civakê ye, ku di axavtin yan rabûn û rûniştina wan de xwe derdixe.

Ev livîn û hizirkirin, erênî yan nerênî be, raştiya vê civakê dide xûyakirin. Kultur mîna panahiya coxrafiyayekê ye ku bi hemû awayekî em dikarin bibînin û sînorê wan berçav bin, û wekî sirûşt mirovan ku bi reng û taybetmendiyên cuda li hev hatiye afirandin, û ji herêmekê ve bo herêmeke din cuda ye, û raştiya hebûna kulturê dikare xwe li raştiya hizra mirov cuda bibîne. Çimkî kultur ji hizra mirov ji dayîk dibe, û piştî bixwe dibe dayîk, û hizran dêxe bin bandora xwe de, û kontrol dike, bê evê ku mirov vê raştiyê bîne bîra xwe ku kultur dikare were guhertin, lê bi xwe dibe êxsîrê kulturek şaş, ku bi xwe afirandiye.

Hekî kulturê rewşek civakî û şiklek xûya bi xwe ve girtibe, dikare bi awayekî civakî were guherîn û çareserkirin, lê hekî ev kultura ku ji dayîk bû, di bin bandora hizrek olî de be, û tevî hemû tex û pirsên civakî bibe, û çi boçûnên cuda qebûl neke, civak bi hemû awayekî ber bi aloziya zêdetir ve diçe, û çareserkirina astengan dijwar û di dawiyê de bêtawê dibe. Çimkî mekanîzma cihgirtina kulturek wisa tenê awayê tirsandin û kuştinê tê bikaranîn.

Komara Îslamî ya Îranê, her di deştîpêka hatine serkar a xwe de, bi başî seh bi vê rewşê kir û bi vî awayî kultura şaş bo gihîştin bi



meremên xwe û deştîbiserdegirtina deskevtên şoreşa gelên Îranê, kuştin û tirsandina xelkê kire mekanîzma rejîma xwe.

Li ber vê hindê bi danîna binke û rêkxistinên cuda û dana deştîhelata bêsînor bi axûndan, bi bê berçavgirtina ti yaseyeke navnetewî û mirovî, mal ji xelkê re kirin heps, û bajar û kolan jî ji xelkê re kirin tirb û tîrbîstan.

Bi vî awayî kultura kuştin û tirsandinê bicih kirin. Bo veşartina van cinayetan û bicihkirina rejîma xwe, deşt kirin bi piropagendeyan ku rêya Qudsê ji Kerbelayê re derbas dibe, û bi vî awayî şerekî nexwestî û bêtawê digel dewleta wê demê ya Îraqê deşt pê kir, û di wî şerê han de nêzî nîv milyon mirovî hatin kuştin û winda bûn. Eva bi merema gihîştin bi Qudsê nebû, belkî bo veşartin û domandina jinavbirina xelkê nerazî yê hundir de bû.

Bixasmanî sala 1363-an heya 1367-an ku nêzî 150 hezar kes hatin qetilkirin, ku piraniya wan kesane li Rojhelatê Kurdistanê bûn û piranya wan bi pîlankarî jiyana wan jê hate standin û kultura han di demên cuda de û bi awayên cûrbicûr heya niha berdevam e.

Li vir pirs ew e: Gelo ew kultura han ku bi çemê xwînê bi awayek berçav ku di civakê de cih girtiye, piştî herifina vê rejîma han wê çi encamek hebe? Gelo hekî heştî tolvekirinê mîna îro ku heye bimîne, dibe em benda çi rewşekê li kolan û bajarên paşeroja civaka Îranê bin? Gelo man yan jinavbirina kesên ku girêdayî rêjîmê ne, wê çi bandorekê paş xwe li ser civakê bihêle? Gelo bona awayê çareserkirinê yan binbirkirina vê kultura şaş kîjan mîkanîzm hewce ye?

Di vê derheqê de em dikarin çend ezmûnan bixin ber çavan.

Yek ji van şoreşa serxwebûna Elceyazirê di sala 1960'î de ye, ku piştî serkevtinê berevajî deştîhelata pêş xwe kultura kuştinê nedomandin. Yan şoreşa Hindûstanê di sala 1947'an de, û her di vê derheqê de şoreşa Vîtnamê di sala 1969'an de ji van şoreşa bû ku kultura kuştin û tolvekirinê bi awayekî cuda ji şoreşa gelên Îranê di sala 1979'an û şoreşa 1917'an ya Rûsiyayê çareser kirin, lê ezmûna şoreşa Îranê û Rûsiyayê, berevajiya şoreşên navbirî bi awayek berçav ev kultura şaş zindî kirin, û encama wê ew e, ku ne tenê civaka van du welatên han bi xwe ve mijûl kirine, belkî ber bi têkdana rewşa hemû herêma Rojhilata Navîn ve pel avêtiye, û herêm kirine çemê xwînê û peşqela agir.

Zimanê Kurdî

(Te çi ji wê re got ?)

(Te çi jê re got ?) .

- (Li) :

- Em li bajêr in

(Em li wî ne) (Em lê ne) .

- Em li dîbiştanê dixwînin

(Em li wê dixwînin) (Em lê dixwînin) . - (Bi) :

- Azad bi karê xwe dilxweş e

(Azad bi wî dilxweş e) (Azad pê dilxweş e) .

- Azad bi bêrê kar dike (Azad bi wê kar dike) (Azad pê kar dike) .

- (Di) :

- Gund di çiyê de hene

(Gund di wî de hene) (Gund tê de hene) .

- Masî di avê de dimînin (Masî di wê de dimînin) (Masî tê de dimînin) .

Têbînî : 1- Cînavê kurtebirr û pevxistî (ê) li şûna cînavên yekjimar tenê bikar tê, çi ew cînav, yê nîşandan bin, yan jî yê kesî bin. Anku, li şûna cînavên komjimar bikar nayê . 2- Cînavê (ê) şûna berkarê nerasteder digre. Anku, di rêxistina hevokê de, berdewam berkarê nerasteder e . 3- Cînavê pevxistî, (ê) cînavêkî nêtar e (nêremê ye), cihê cînavên nêrza û mêza digre . Wek :

- Min dayê .

(Min da wî, wê) .

- Min jê re got . (Min ji wî, wê re got) .

4- Durişt e ku (2) cînavên bêhêl,ên pevxistî di

hevokekê de li pey hev bikar bên

Wek :

- Min jê lê pirsî

(Min ji Zînê li birayê wê pirsî)

5- Ji hêla dengsaziyê (fonîtîkê) ve jî, sedema ku tîpa

(b) û (d) bi cînavê (ê) re dibin (p) û (t) ew e, ku cîderê dengê (p) û (t), ji cîderê dengê (b) û (d), nêzîktirî cîderê dengê (ê) yê ye .

6- Hindek ronakbîrên kurd dibêjin, kurtkirin û

pevxistna cînavê (ê) yê, şêweyekî devoka gelêrî

ye,ne durişt e ku di zimanê nivîsînê de bikar bê .

Bi dîtina min, ev gotin ne rast e. Kurtkirin û

pevxistina (ê) yê dirûv û nîşana xwevejîn û

jîndariya zimanê kurdî ye. Ji ber ku çendî ziman

karibe xwe sivik bike, hevçendî jî, ew ê karibe bi

demê re xwe vejîne .

B- Cînavê Xweyî (Xwe) :

Li hindek herêman cînavê “xwe” bi şêweyê “xo, xe” jî tê gotin . Ev cînav di pertûkên rêzimana kurdî (KJ) de bi çend navlêkirinên têvel hatiye :

- “Cînavê Serbixwe” – Qenatê Kurdo . - “Bernavê Bêhêl”

– Reşîdê Kurd . - “Pronavê Bîrdar” – Kamîran Bedirxan . -

“Cînavê xweyî (xweser) – Sadiq Behadîne Amîdî . - “Cînavka Zîvirandî – Feqe Huseyn Sagnîç .

Bi baweriya min, navlêkirina (xweyî), nêzîktirî têgeh û bikaranîna cînavê (xwe) ye. Ji ber vê yekê min jî ev navlêkirin pijirandiye da ku ev cînavê bêhêl, bi vî navê taybetî, ji cînavên bêhêl, ên dîtir bête nasîn. Lê digel vî navî jî, dîsan (xwe) cînavêkî bêhêl e, li şûna hemu nav û cînavên yekjimar û komjimar, yê her sê kesan bikar tê : 1- Kesê yekem ê peyîver . Wek :

- Ez xwe diparêzim

- Em xwe diparêzin - Min xwe parastîye - Me xwe parastîye

2 - Kesê dûwem ê guhdar :

Wek :

- Tu xwe fêrî zimên dikî

- Hûn xwe fêrî zimên dîkin - Te xwe fêrî zimên kiriye - We xwe fêrî zimên kiriye

3 - Kesê sêyem ê nediya :

Wek :

- Ew xwe dişo

- Ew xwe dişon - Wî xwe şûşt - Wê xwe şûşt - Wan xwe şûşt

Dom heye...

Biryara cezaya parlementerên HDP bo parlemena Tirkîyê hat şandin

Dadgeha Bilind a Tirkîyê biryara xwe ya di derheq cezadana parlamenterên “HDP”ê de ji Serokatiya Parlemena Tirkîyê şand ku wisa tê xûya kirin 2 parlamenterên HDP”ê ji destê wan bê şandin.

Pêka nûçeyên belavbûyî, roja 26’ê Îlonê, Dadgeha Bilind a Tirkîyê biryara ceza-

kirina ji doza “KCK”ê ya parlementerên HDPê ji bo Serokatiya Parlemena Tirkîyê şand ku tê çaverêkirin mafê parlementerîya 2 parlementerên HDPê “Leyla Guven û Musa Farisogularî” ji wan bîn şandin.

Parlementerê HDPê Musa Farisogularî bi 9 salan û Leyla Guven jî bi 6 sal û 3 mehan

ji doza KCKê ku ev 3 sal zêdetir e berdewam dikir hatibûn cezakirin û Dadgeha Bilind a Tirkîyê jî cezaya wan pejirandibû.

Hat ragihandin ku dadgehê biryara xwe ji Parlemena Tirkîyê re şandiye û dema biryar di civîneke parlemenê de were rojevê, dê mafê parlementerîyê ji “Musa Farisogularî û



Leyla Guven”ê bê şandin.

Serokê Koma Parlamenê yê HDPê “Saruhan Oluç”jî dabû xuyakirin ku ihtimal heye li dijî HDPê dozên nû vebin û mafê parlementerîya parlementerên wan ên hatine cezakirin ji wan bê şandin.

Dibistanên Kanêksî dersxwanên deverên derdora bajarê Urmîyê raştî pirs-girêkan kirine

Dibistanên kanêksî darîşeyeke mezin bo dersxwanên devera Somaubiradûst ya ser bi bajarê Urmîyê çê kiriye, û demsala sirê jî nêzîkbûye û dersxanên wî deverê raştî pirs-girêkan hatine.

Pêka nûçeya ku gihîştîye malpera “Kurdistanmedia”yê, di devera Somaubiradûstê ya ser bi bajarê Urmîyê de nêzî 30 dibistanên kanêksî hene û bi sedema hatina



demsala sirê, zarokên wî deverê raştî pirs-girêkan hatine.

Welatîyên wî deverê bi malpera “kurdistanmedia”yê re ragihandine ku: Di wir ku çendîn dibistanê

kanêksî henen, dema ku sibêzûyan zarok diçine dibistanan di wan kanêksên sar de dersê dixwinin.

Herwisa dane zanîn ku, me ji birêveberê dibistanê re gotiye şifajên petrolî hil bikin, lê ji me re dane zanîn ku xirab bûne û petrol jî nîne. Me serdana binkeya Perwerde û Hînkariyê jî kiriye, ji me re gotine dibe hûn pareyê petrol û çêkirina şifajan vala bikin.

Eve di halekê de ye ku, hersal bi wî awayî perê petrol ji malbatên zarokên dersxwanan distînin û ne sofajan hildikin ne jî petrolê dikirin.

Devera Somaubiradûst ku nêzî sînorê Tirkîyê ye, demsala sirê zû tê û dibistanên kanêksî di wî demsalê de wekî bûzê lê tên.

Bi wî awayî zarokên wî deverê raştî pirs-girêkan hatine, gelek caran bi sedema sirê nexweş dikevin gelek caran jî dest ji xwendinê ber didin, û rejîm jî tu fikrekî bi halê wan re nake û tenê di fikra kiriyarên terorîstî li derveyê welate.

Egere gola Urmîyê bi temamî zuha be, divê bajarê Tewrêzê bê çolkirin

Rewşa hewa wisa kiriye ku çêbûna bahoza xwê Ra gola Urmîyê him yê dawiyê bi jiyana canjiberên jêr û bin erdê bîne, her bi wê sedemê Îsa Kelanterî rêveberê Saziya Paraştina Jîngeyê a rejîma Îranê daye zanîn, Egere gola Urmîyê bi temamî zuha be, divê bajarê Tewrêzê bê çolkirin.

Rêveberê Saziya Paraştina Jîngeyê a rejîma Îranê, Îsa Kelanterî roja pêncşemiyê 4’ê Rezberê di gotarekê de li bajarê Meşhedê, guhertina hewa li Îranê û rewşa herî dawî a jîngeyê nîrxand û da xuyakirin ku, rewşa hewa li Îranê gelek metirsîdar e û di bîst salên derbasbûyî de rêjeya baranbarîne herî kêr 50 mîlmêtran daketiye. Herwisa derceyek û nîv santîgirad jî hewa germtir bûye.

Herwisa navbirî amaje bi mezaxtina 9 milyar Tumenan ji bo rizgarkirina gola Urmîyê ji zuhabûnê û ragihand ku eger ew gol bi temamî zuha bibe, baştir e ku bajarê Tewrêzê bê çolkirin û ti kesek li wir nemîne.



Di derbarê pirs-girêka tozê de li hin parêzgehên Îranê jî got ku li navxwey Îranê di vê derbarê de pirs-girêkên wan hene û lewma jî ew nikarin ji bo çareserkirina wê li welatên derdorê, alîkariya wan welatan bikin.

Di salên derbasbûyî de pirs-girêka tozê li Îranê gelek welatî raştî nexweşiya tengenefesiyê anîne û li gor çalakvanên jîngeyê, aliyên rejîmê weke pêwîst ji bo çareserkirina vê pirs-girêkê tev nagerin.